

Piştî zarokjiberbirin

Xwînjêhatin û êşên zik û navzîkê tişteki normale.
Xwînjêhatin ji zarokjiberbirin bi rêya derman zêdetir dikişîne.

Heta çend roj piştî zarokjiberbirin xwe re şiyar be.

Ji bo sekinandina kotibûnê, di rojên yêkê de tu nikarî hemam bikî (tenê serşûştin dibe), Tamponê jî nikarî bikarbînî û têkilîyê cinsî jî nabe hebe.

Eger çend rojan ta hebe (jor 38,5 derece) an avê kotibûn ji ber te biçe, tu dive herî cem bijîşk.

Piştî zarokjiberbirin çerxeka nû tê destpêkirin.

Yanî, tu dikarî dîsa ducan bibî. Eger nexwazî ku ducan bibî, divê ku pêşgirtin bikî. Bijîşka jinan an şîretvanê pesendkirîya dewletî dikarin rêyên cur bi cur ji bo pêşgirtina ducanbûnê bidin pêşkêşkirin.


Şîretvanê nêziya xaniya te

Karkerên ofîsê şîretvan zaniyariyên te vedişêrin.
Netirse eger kesek ji wan karkeran li tişteke bê agadarkirin.

Navnîşanên şîretvanên nêziya xaniya xwe dikarî li vir peyda bikî www.familienplanung.de

Navnîşanên şîretvanê malbatan jî li ser vê linkê mêze bike www.profamilia.de

Derbara me: © 2015, **pro familia** Deutsche Gesellschaft für Familienplanung, Sexualpädagogik und Sexualberatung e. V., Bundesverband, Stresemannallee 3, 60596 Frankfurt am Main, Telefon 069 / 26 95 77 90, www.profamilia.de, 1. Auflage 2015, 10.000
Em Alikariya mali distînin li Navenda Federal ji bo Çavdêriya Selameti (Bundeszentrale für gesundheitliche Aufklärung – BZgA).
Berhevok: Claudia Camp




Kurzinfo: Schwangerschaftsabbruch nach
Beratungsregel - Fassung auf Kurmanji

pro familia

AGEHÎYÊN KURT:

**ZAROKJI
BERBIRIN
PIŞTÎ ŞÎRETKIRIN**

KURMANCÎ



Tu ducan î û ser zarokjiberbirin difikrî?

Tukes na lê tu bi tenê biryar distînî, heke zarokjiberbirin bê encamdan. Zarokjiberbirin li Almaniya bê siza mimkin e, eger sê tiştan bèn hizrîn/mêzandin.

1. Tu divê herî cem **şîretvanekî zarokjiberbirinê ku qebulkiriyê dewletê ye.**

Ev şîretkirin bê pereye.

Piştî şîretkirinê, **belgenomeya şîretkirinê** didin te.

Ev belge name divê bê pêşkeşkirin li ofis bijîşk, li vir ku zarokjiberbirin tê encamdan.

2. Navbera şîretkirin û zarokjiberbirin divê sê rojan be.

3. Ducanbûnê dikare tenê heta dawîya hefteya 12 be (an 14 hefte piştî dawîn ade) û tenê bijîşka jin an bijîşkê mêr dikare ducanbûnê bidawî bîne.

Emirê ducanbûnê ji aliyê bijîşkê jin an mêr tê piştrastkirin.

Li şîretkirinê de, navnîşana bijîşkên ku proseya zarokjiberbirin dikin, didin te.

Agehî li ser zarokjiberbirin piştî zêdegavî, tawanên piştrastkirî („kriminologische Indikation“) an ji ber sebebên bijîşkî dikarin li ser vê belavokê bi zimanên („Schwangerschaftsabbruch“, Almanî, Inglîzî, Rûsî, Tirkî, Kroatî û polonî) bixwînin, www.profamilia.de/publikationen

Çiqas pere dixwaze?

Eger tu pere heye, tu divê bixwe pere ya zarokjiberbirin qebul bikî.

Pereya ev 270 û 500 € ye.

Eger tu **alîkariya civakî, ALG 2** an alîkarî li gor **yasayên penaberiyê** distînî, tu nabe bihayê zarokjiberbirin bidî.

Ev Dewleta Federal ku hûn li vir dimînin, bihayê vê tiştê qebul dike.

Tu divê biçî **Bîmeya yasayîya Tenduristî** (wekî mînak **AOK**) û **Belgenomeya pejirandina bihayê („Kostenübernahmebescheinigung“)** bistînî.

Ev belgeyên te ku nîşan didin ku tu li Almaniya dimîni û çiqas alîkarîya malî distînî, divê bi te re be.

Belgenamaye pejirandina bihayê („Kostenübernahmebescheinigung“) divê berî zarokjiberbirin bê standin û li ofisê bijîşkê bidin pêşkêşkirin, li vir ku zarokjiberbirin tê encamdan.

Li ofisê bijîşk

Ji bo zarokjiberbirin, ev tiştên jêrî li ofisê bijîşkê bidin pêşkêşkirin:

1. **Belgenomeya Şîretkirinê („Beratungsbescheinigung“)**
2. **Belgenamaye pejirandina bihayê („Kostenübernahmebescheinigung“)** an pereyê bijîşk
3. **Kertê bîmeya Tenduristî** an belge nameya tenduristiyê
4. Belgeya **Core Xwin**, eger hebe

Berî zarokjiberbirin, bijîşka jin an mêr axaftinek bi te re çê dike.

Bijîşk divê te re şirove bike, ku çi tiştêk tê encamdan di dema zarokjiberbirin û çi xeter hene.

Proseya zarokjiberbirin dikare bê encamdan, tenê eger tu hemu axaftinên bijîşkê fêhm bikî.

Eger tu zimanê Almanî nizanî an kêmbûnê dizanî, kesek divê bi te re be ku zimanê Almanî wergerîne ser Kurdî.

Zarokjiberbirin

Piraniya zarokjiberbirinan **operasyoneke ku bi awayê avkêşkê kirin/mêjîn** tîncamdan.

Piştî çend katjimêran tu dikarî wegerî mal.

Zarokjiberbirin bi awayê tezinê giştî an benckirina xwecihî tê encamdan.

Piştî tezinê, qirika malzarok bi çoganeke hesinê tê dirêjkirin.

Paşî tevînekê ducanbûnê bi rêya borîyekê tê mêjîn/avkêskirin.

Ev prose tenê çend deqe dikêşîne.

Proseya ducanbûnê bi rêya dermanê jî tê qetandin.

Ev jî (nîvî) di jêr çavdêriya bijîşkê tê encamdan.

Dermanê zarokjiberbirin tenê heta hefteya 9`an proseya ducanbûnê tîncamdan.

Ji bo zarokjiberbirin bi rêya dermanê divê dû an jî sê çar biçî ofîsa bijîşkê.